QITÊBXANA HAWARÊ
HEJMAR
2

# RÛPELINEN ELFABÊ

Çapxana Tereki
ŞAM
193_

QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

2

# RÛPELINEN ELFABÊ

Çapxana Tereki
ŞAM
1932

# Pêşgotin

Bi şeş hejmarên Hawarê ên pêşîn me hin rûpelên elfabê belav qiri bûn. Bi wan rûpelan me hîmê Elfabêya Qurdî didanî û ji xwenda û zanayên qurdan, fiqrên wan li ser elfabêyê pirsîyar d'qirin.

Ji ber wan rûpelan sed û pêncih dest ma bûn. Min dil ne qir qo ew rûpelên ha winda bibin. Min ew dane hev û çend rûpelên din bi ser xistin, û pê qitêboqeq hate pê. Ev qitêboqa ha, bîra Elfabêya Qurdî a pêşîn e qo nifşên dawîyê lê fedqirin û pê bizanin qo pêşîyên wan di çi tuneyîyê de elfabêya pêşîn da bûn çap qirin. Ji bona pêqanîna çermê wê divîya bû qo çend rûpelên din biqevin pêşîyê.

Bi vê hêncetê min dil qir ji xwedevanên xwe re berpêqirina elfabêya me bi qurtî gilî biqim.

Ev elfabêya hanê qo îrû em zmanê xwe pê dinivîsînin pişîya xebateqe salinen drêj e.

Di sala 1919 de, me da bi çiyayên Meletyê. Em qeti bûn nav eşîra Reşwan. Mêcer Nowel (ingilîzeq) jî digel me bû. Mêcer zarê nivro dizanî bû, dixebitî qo hinî zarê baqur bibe, û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medheloq, stran û çîroq berhev di qirin.

Carinan me li nivîsarên xwe çavên xwe digerandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi bilevqirineqe biyanî, lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend, lê belê ez, heta qo min (û, و) ji (o, و) û (î – ى) ji (ê – ى) h. p. derdixistin, diqetim ber hezar dişwarî. Ma çiman?.. ji ber qo Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yeqê, di cih de min kerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî elfabêyeq lêqanî. Êdin minê

biqariya destnivîsa xwe pış hezar salî ji bê dişwarî û weqe xwe bixwînim, ji ber qo her deng cihê cihê liser qaxezê dihat seqinandin.

Lewra qo di Fltabêya Latînî de tinê ( 26 ) herfên serxwe hene û di zmanê qurdî de deng ji bîst û şeşan bêtir in, geleq herf n hevedudanî qeti bûn nav elfabêya min ; weqo : ch, ou, ai....

Ji xwe di zarotiya xwe de, weqê min di dibistanın de dixwenı û hînî herfên erebı û latinî dibûm, tişteq hebû qo min di çavê xwe ra diqir û ji bona herfên erebî, di dilê xwe de digot, ev elfabêqe welê ye qo dengin dide xwendin qo nayine nivîsandin, û latinî yeqcar vajîyê wê ye, herfin dide nivîsandin qo nayine xwendin.

Belê fiqra min di babeta van her du elfabêyan de ev bû. ʿawer biqe bi vê fiqra qo min ji zarotiya xwe ve di soxê xwe de bixwedi diqir, qê'a min ji herfên hevedudanî re ne dihat.

Hingî ji zmanên qo bi herfên erebî nayine nivîsandin min yûnanî, hiniqî frensizî û elfabêya rûsî nas diqirin. Hema dı çîyê de, rabûmı herçi herfên hevedudanî ji elfabêya xwe derêxistin û li şûna wan ji elfabêya yûnanî û rûsî herfinen serxwe êxistin.

Bi vî awayî, min elfabêyeq bi sih û şeş herfên serxwe êxisti bû destê xwe.

Weqê em vegeriyan hatin Stenbolê bi vê elfabêyê min qitêbeqe elfabêyê û ferhengeqe qiçiq nivîsand û ji bona çapê qar qiri bûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng îrû ne di destê min de ne. Di sala 1925 a de digel hin nivîsarên min êu din gehiştine heta pêşberê Mehqema Xarpûtê.

Sala 1924 a de, li Elmanyayê min careqe din çavê xwe li elfabêya xwe gerand, hûr lê mêze qir û mideqe xwe liser xebitîm. Min bala xwe dıda û didît qo ev

sê texlît herf kenc lihev ne dibatin, herfên yûnanî û rûsî yeqrengîya elfabèyè xirab diqirin. Jû pève tède du herf hebûn qo ji me re ne gereq bûn. Ji lewra min elfabèya xwe ji nû ve senifand: herfên zède jè avêtin, hin herfèn latînî bilindeq li wan bar qirin û di şûna herfên yûnanî û rûsî de èxistin. Bi vî awayî elfabèqe bi sih û çar herfan û yeqreng hate pè.

Ez paşè jî bi elfabèya xwe mijûl dibîm. Lè hetanî qo tirq elfabèya xwe belav qirin ya me weqe xwe dima û tède me tişteqî bingehî ne diguhart. Min her tiştèn xwe pè dinivîsandin û nasèn xwe re dida zanîn.

Weqê tirq elfabèya xwe belav qirin me dît qo di dengên hin herfan de elfabèyèn me ne mîna hev in. Dengin hebûn qo tirqan ne bi wan herfèn qo me nîşan qirine lè bi herfınen din nîşan qiri bûn.

Herweqî me berî jî çend caran goti bû, ji bona hêsanîqirina xwendina nivîsarèn me, ji qurdmancèn tirqiyê re, me dengên hin herfan bi hev guhartin û herçend hebû me ewçend elfabêya xwe xist nîzingî elfabêya tirqan.

Ji gotinên jorîn kenc xuya dibe qo elfabêya me paşîya xebateqe sèzdehsalîn e, gora zmanê qurdî, gora dengèn zmanè me ye. Herè ev elfabè berî sèzdeh salan hatiye nivîsandin û gora zmèn û dengên wî hîn bi hîn edilî û qet halê xwe ê îrû.

Berî û piştî belavqirina elfabèyê min fiqrèn geleq qesan pirsîn û gotinèn hineqan bi qêrî min hatin. Di nav wan de mirovinen yeqcar nexwenda jî hebûn.

Ji lewra ez vê elfabèyê ji qeda xwe bètir qeda miletê xwe dihesibînim û pêşqeşî wî diqim.

Ji xwe herçî yê wî ye, ji yê herqesî hêjatir û spehîtir e.

Şam: Taxa Qurdan: 28 Çirîya Paşê 1932

*Celadet Alî Bedir - Xan*

A D R
a d r

da ra a ar da
DA RA A RA DA

RA AR A DA AD
ra ar a da ad

ADAR

Dar ad ar da ra a ar da
Dar rada dada adar ar

*A, a. D, a. R, r.*

*1. 1. 1.*

E M

e m

me re a er de e ed

ME RE A ER DE E ED

ma em e am da

Rem dem med dar mem mer mam.

Adem. Emer. Darmer. Dem. Mermer.

DARMER

Mem e. Adar e. Mar e. Dem e. Dar e.

Mede, mar e. Dem e, rade. Darmer e.

*M m. E e.*

*Mede mar e*

*2. 3*

# B N
# b n

A BA AN NA BE NE E
a ba an na be ne e

bar nan man men ben ban ran den

DERMAN

Baran berber beraber bermede berda radan
rabe bende badan derman

Mem berneda. Emer ne da. Derman e.
Mem rada, Adem bada. Emer dada.
Ne baran. e.

*B b. N n*

*Mem baneda. Emer bada*

*4 5 6*

# I Q
# i q

QA I QE A EQ E

qa i qe a eq e

qar qin qer niq qen qab din

eq min mir rim bin

Raqirin. maqer, qerem. bireq qirin, qeriq. berdan, radan, derman,

## NEMIR QIRIN

Nemir raneqir. Min Mem berda. Min dar raneqir. Nan nerm e. Nemir em bernedan. Bi min niqarin. Em berdidin. Nan ne nerm e. Mirad em bernedan. Maqa min e.

*I, i. Q, q.*

*Nan ne nerm e.*

*7 8 9*

# Ê ê

mê ên qê

MÊR QÊR NER

bêr mer qer qêr dêr ner
der ber bar qar ben nan

## DERMANÊ NEMIR

Qêra min rind e. Dêr bidar e. Nemir mêr e.
Dermanê min rind e. Qêriqa Nemir ne rind e.
Emer dermanê min ne da.

*Ê ê*

*Dermanê min rind e*

*10. 11. 12.*

# Î î

BÎ DÎ ÎN MÎ RÎ

mîr din bir der mir rim bir
qir nêr qin mêr dem

## NERÎMAN NERMÎN

narîn, dîn, mêranî, nermiq

Nerîman mêr e. Nermîn narîn e. Mem mîr e. Adar e, baran dibare. Nemir mêreqî rind e. Nanê Nermînê nerm e. Nanê Nerîmanê ne nerm e.

*Î î*

*Nermîn narîn e*

*13 14 15*

A E I Ê Î

a e i ê î

D R M N Q

d r m n q

ber den bîr nêr dan dîn mîr qer

mar man ban mêr bar ben

Bênder, narîn, dêmanî, dirandin, qerîbîn, qadîn, qebanî, nermî, bireq, berbir, beraber

# BÊNDER QADÎN

Qadîna me. Nerîman berbir e, beran dibire. Min derî dada. Mirad Nemir berneda. Nemir qeribî.

*A B E I D Ê J R M N Q*

*a b e i d ê j r m n q*

H L

h l

HER LAL MIL REL

her lal mil rêl

qêl rih mal bel rél meh

lal her deh hem

Dermale, hilanîn, delal, lèdan, hirî, bermal, hildan, hêlîn, qelandin, nalîn, hèrandin.

# ERDELAN BEHDÎNAN

Hêlîna delal. Min dar hilanî. Qê hilda? Banê me bilind e. Qî hildide? Deh dermale hene. Mala hanê mala Nerîman e, mala din mala Nemir e.

*H L*

*h l*

*Hêlîna Delal. Badana bendere*

*16. 17. 18.*

# P T
# p t

## pê ta tî pa ap

### PAR DEP LAT TAL

Tìr pèt paq tèr pèl lep pîr neh mìr dèl
pir pèr dem hèt ter pal dep meh

# PARPAR TÎRMAR

**Pale, rêtin, talan, repin, talde, pèrar, hilindeq, qêtin, hèlîn, raqetin, qelandin, pîriq.**

Di dora bèndera me de deh dar hene. Pale hatin. Nemir û Nerîman di qadînè de ne. Li adarè baran diba re. Mirad darè hilanî. Nerîman raqet.

*P p T t*

*Pale hatin. Tîr û tîrmar*

*19 20 21 22*

Z G

z g

EZ GA ZA

ez ga za

gaz zer gir zîn nêz bez rêz zad pez naz
riz ger zêr ter

# ZIRQAN ZÎLAN

Bazar, bager, nezan, giran, ezman, agir, zana, razan, gerandin, hêdî, garan, rengîn, hilî, marî, rêzan.

Bazar nîzing e. Ez ne zirqî me. Ezman ne nizm e. Ber giran e. Darên me zer in. Nemir ez bernedam. Di mala me de deh mêr hene

*Z z G g*

*Gir Zîlan Garan Zêr*

*23, 24, 25, 26*

# O. o

## TOR LOR ZOR DOR

**Bor qoq boz qor por qom pol mor tor**

Qopal, borîn, zozan, borandeq, gorin, lorî, qortal, lorandin, qoziq, toraq, peritandin

Zozanên Hereqolê bilind in. Zozanê me geleq nîzîng e. Ez di qoziqê de me.

# Û û

Hûr dûr par qûr rûn bûn gon bûq rût

## HARÛNAN HEREQOL

Zaro, tûriq, rûmet, genim qûntar, hingûr. Ez li malê bûm. Bûqa me bi me re bû. Lazgîn ji qadînê derqeti bû.

*O. o Û. û*

*Hereqol Botan Qerqûq*

*27 28 29*

J X

j x

Rûj, roj, xêz, mêj, jin, xan, jîr, mij. dox, xêr, tax, bej, jar.

Bajar, xezal, rûjname, qendal, jentin, jorîn, der zan, pejel, doxîn, nazenîn, hejmar, rûmet, qûntar, zozan.

# JÎLAN XARPÛT

Taxa me taxaqe paqij e, Hereqol li Botan e. Qêriq di bêriqa min de bû. Bozo ji oda jêrîn derqet.

Di bajarê me de deh tax hene. Doxîn û derpî. Rûjname bi min re bû.

*J, j X, x*

*Jajîron Xarpût Xezal*

*30 31 32*

# ERD RENG NIZM
# erd reng nizm

Deng reng piling erd nizm emr bilind qereng
meng zend bejn beng derd gazind
bazing jeng rind zexm hing

## PILING BILIND

Piling zexm e. Deng û pêjn. Zoro èzing anî. Mil û zend. Dar û èzing. Bilind û nizm. Min pilingeqî zexm dît. Rind û nerind. Lepên pilingî. Darên hûrqirî èzing in. Mirad ji me gazindan diqe. Nezanî derdeqî mezin e. Nemir mèreqî qèrhatî bû. Xanî ji darè ne bilindtir e.

*Rengê pilingî beleq e.*

*32 33 34 35*

# F V W

# f v w

# OF VÊ WÎ AV EW
# of vê wî av ew

Ref fîl vèn wan rev dev def vir dav
wir qef hav qof fen

# HEMAWEND HEVÊRQAN

Rojava, dewlemend, firavîn, girav, navro, fılar, devling, bandev, vala, firfiroq, vajî, xêwet, navmal, rovî, havîngeh, zîvîng, ferheng.

Ez ji avê diborim. Bavê min dewlemend e. Li havînê bajar germ in. Qew ref bi ref difirin. Qadina me vala namîne. Qon û xêwet.

*F. f. V. v. W. w.*

*Firavîn Vajî Werîs*

*36 37 38*

Ee Ii Aa

Êê Îî Oo Uu

Dd Rr Mm Bb Nn Qq Hh

Ll Pp Tt Zz Gg Xx Ff Vv Ww

Der ref rût nèr qar rèl zor jor ba mêr qer xêr def hûr qof hîm pir tor por bûq hîm.

# EGIL PÎRAN

Par û pêrar geleq berf hebû. Rengê zêrî zer e. Pira zaxo geleq qevn e. Di rèlên Botan de ge'eq rawir hene. Bozo û Mirad ji bajêr hatin

*R E W A N D I Z*

*Par û pêran geleq berf hebû*

*39 40 41*

# Çç Ss

## ÇO SE ÇI AS

## ço se çi as

Çar sor das pûç çem qes baç nas sar
zeç sol çil çûn ser sìr çiq çeq

# SÎPQAN ÇEMÇEMAL

Sìngebend, serban, çarniqar, sazbend. solìn, çiroq, masì, dasì, vesihandin, hesp, serqanì, savar, gevizìn, sersal, soqì, çîman,

'oro sazbendieqì bi 'nav û ɗeng e. Savarè me dane tavè. Kûnè savara me bindiq bû. Me hespèn xwe vesihandine. Masì gelıq bidasì ne. Sìngebenda hespè min avzèrqirî ye.

*Ç. ç S. s*

*Çarniqar Sazbend*

*42 43 44*

# K k Y y

## ker yar key rek Kaz

Dek Nay Ker Kaz Yar Kir Yan Key
Rek Kiz Pey Mey

kelem, kapan, kelîsêl, yarî, beyar, kels, eyar, kerase, neyar, leylan, kevd, pêxember, dûyîn, peyda, nivistin, diyar, seyandin, rêhesin.

## LORISTAN DEHKORÎ

Dîwarên me dûyî ne. Kelûna bavê min dirêj e. Gelîyê Goyan gelîyeqî asê ye. Tevniqa pîrhevoqê teniq e. Ev bajarê ha ji mêj ve ava bûye. Silêmanî bajareqî qevnar e. Gelîyê Zîlan di welalatê jorîn de ye.

*K k. Y y.*

*Kelîsêl, kaz. Yar, yarî*

45 46 47

# Ç ç Ş ş

# ÇIL GEŞ ŞÎN

Şên, tac, çil, geş, reş, çar, çib, çom, çin, pêş, şan, çan, şer, şal

## ŞEKLAVE ÇIBRAN

Şahîn, çarçîm, çîran, şivan, şevgêr, beroş, çêwî çivoq, hêştir, temaşa, hêştir

Hevind çibrî û kenco çelalî ye. Cihangîr hertûşî ye. Min serma hılanîye, çanê min diêşit. Çend peyayên sorî hatine Şemdînan. Fêrezor şingalî ye.

Stûr Bra Spîndar Blûrvan

Ez û Gefo em çû bûn Diyarbeqrê. Hin tişt hene qo bi kençî çênebûn, bi zorê çêdibin

*Ç ç, Ş ş*

*Qepir zozanê bavê Têlî begî bû.*

*48. 49. 50.*

# U u
# Swind - Sund

Gul Qur Gur Qul Qun

## QURDISTAN QURDMANC

Qurdistan welatê Qurdan e. Silêmanî nîveqa Qurdistana nîvro ye. Gundê me ji qûntara çiyê ber bi çem e. Çiyayên Sasûnê asê û bilind in. Bergehên gundê me geleq spehî ne. Qurdmancşah yeqî ji bajarên Qurdistane ye. Muqrî bireq ji welatê Qurdistanê ye. Şagirt li ser rûniştegan rûniştî ne. Sinandiz jî ji bajarên Qurdistanê ye.

*U u*

*Qurdistan Qurdmanc*

*Xunaveqe hûr li ser me dê dihat.*

*51 52 53*

# XWE XWÊ

Xwedê, xwenda, xurdeq, xwîn, xwarzî, xwarzê, xwê, derxwîn, xurt, xwestî, xweh, xwas, xwêh, xwezgîn, daxwaz, xweyîng, xwîşq, xwelî, xweher, xurifî, xwesû, xwezûr, xulam, xunav, xweyî.

# BILBAS DIZEY

Xwedê dinya û mirov afirandine. Jinên Qurdistanê di şinên xwe de qezîyên xwe dikusînin û xwelî li serên xwe diqin. Xweha min ji min qiçiqtir e. Gurgîn xwarzîyê min e. keşem brazêya Remo ye. Xunaveqe hûr bi ser me de dihat. Tifingên nêçîrê bi xurdeqî dadigirin.

Bêrdoşı berîvanan bê derxwîn e. Gulê xwesûya Dilovanê ye. Lazgîn xwenda ye. Ezdînşêr xorteqî xurt e. Ev mase xweher e. Evrîst her heşîn e. Di çiyayên me de geleq guhîj hene.

*Rabe here niq heval û qalan*
*Da tu neqevî newal û çalan*

54 55 56

Ẍ ẍ: Caẍ Aẍa Ẍar

Suwarê me ẍar berdane dijminan. Pencereyên me caẍqirî ne. Ẍerzan û Boîan tixûbî hev in, tinê aveq di navbera wan de diherige.

Ḧ ḧ: Ḧek Ḧal ḧeyran

Ḧesenan, Ḧeyderan û Celalîyan ji eşîrên Serḧedan in. Felît, qurê cîrana me ḧeyranîya dêya xwe bû. Ez bi ḧewandina mêvanan şa dibim.

Sin'et — Sinhet De'wa — Dehwa

Deḧwa min ne bi te re ye. Fèrezûr, bûrayê min, xorteqî bi sinḧet e. Saeta min ne bi min re ye.

# SERḦEDAN ẌERZAN

O o Ö ö
Qor, Gol. Qör, göl.

57 58 59 60

# Zman û Elfabêya Qurdî

Ez qurd im. Zmanê min qurdî ye. Ez bi qurdî daxêvim, dixwinim û dinivîsînim.

Zmanê qurdî bi elfabêya qurdî têt xwendin û nivîsandin.

Elfabê ji herfan hevedudanî ye. Herf di şiqlên xwe de du texlît in; çapnivîs û destnivîs.

## Çapnivîs

a b c e ç d i g h x ê j î k q u l
m n o p r s ş t û f v w y z

## Destnivîs

*a b c e ç d i g h x ê j î k q u l m n*
*o p r s ş t û f v w y z*

## ROJQAN DUMILAN

*Dermanegî çêge bo birînê*
*Da tu neqevî di nav nivînê*

*61 62 63*

# Dîq û Rovî

Di gundeqî xerab de', dîqeq hilqişiya bû ser dîwarê xanîqî û banq dida.

Rovîyeq daborî, xwe da ber dîwêr û deng li dîqî qir û got :

— Qeqo, dîqo çî diqî bir?

Dîq lê vegerand û got :

— Rovîyo ma tu nabînî gundê me xerab bûye. Ez jî bang didim, dixwazim çend gundî û cotqaran bidim hev û gundê xwe ji nû ve ava biqim.

— Heqe welê ye, ma tu nizanî qo ez jî cotqareqî qêrhatî me, dê were ciheqî nîşanî min biqe, ji xwe re qoxeqê ava biqim û dest bi xebatê biqim.

Dîq kaîl bû, qet pêşîyê, rovî da pey, qo herin niq qefxwêyê gund ji rovî re erdeqî bibijêrin.

Dîq danehati bû, di ser dîwaran re derbas dibû, diçû.

Gava gehiştin qavileqê, dîq xwe dahilanî deng li qefxwê qir.

Qefxwê rabû rovî dît.

Qefxwêyê te tajiyeqî fêris bû. Rovî baz da, tajî qet pey, da heta quna wî.

Sibetir rovî dîsan daborî. Dîq ew nas ne qir. Çîroqa ava qirina gund jê re got.

Rovî qenî û lê vegerand:

— Bextreşo dîqo. hetanî qo tu qizîrê vî gundî yî û tajî jî qefxwêyê wî ye,ev gund tucar ava nabe.

# 24

# Mar û Mirov

Miroveq bi rê ve diçû. Rastî mareqî hat. Mar qeti bû bin qevireqî mezin. Ne diqarî bû derqeve, ne jî bilive. Dilê mirov pêve ma. Xwe da ber qevirî, qevir raqir û ew xelas qir.

Mar xwe daweşand, ser ziqê xwe rabû û drêjî wî qir. Bi wî vedaya. Mirovî got:

— Maro, ĥeyran, ma çawan dibe, min tu ji mirinê xelas qirî, tu dixwazî min biqujî

Marî got:

— Ma ji mêj ve em ne dijminên hev in, ezê bi te vedim.

Mirov qir ne qir, mar jê nedigeriya. Paşî, gote wî:

— Ket mebît em berin ji ekilmendeqî bipirsin.

Mar Kaîl bû, û dan rê. Gaveqê çûn rastî roviqî hatin. Mesela xwe jê re gotin. Rovî li mirovî fedqirî û qenî. Piştre gote wan:

— Divêt ez cih bibînim qo biqarim kerara xwe bidim. Şûn da vegeriyan û hatin ber qevirî.

Rovî ji mirov re got:

— Tu qevirî raqe.

Ewî ew raqir. Rovî ji marî re got:

— Tu jî biqeve bin.

Mar qete bin û mirov qevir berda ser.

Bîsteqê man, rovî deng ne diqir. Marî got:

— Rovîyo qanî kerara te, ez di bin qevirî de pelixîm.

Mirov dil diqir qo here. Rovî xwe li buwara wî girt û got:

— Careqe din, vî qevirî ji cihê wî rameqe.

# Qer, Gurû Rovî

Rûjqê rovî birçî ma bû, di çolê de digeriha. Ji nişqa ve gureqî ew girt û qir devê xwe. Rovî qenî û pesnê Xwedê qir. Gur lê ecêbmayî ma û got:

— Rovîyo! ev çi qene, ezê niho te bixum, tu diqenî?

Rovî dîsan qenî û lê vegerand:

— Herê diqenim, ji ber qo tu min bixwî, tinê hêvî diqim drêj meqî, min zûqa bixwî, da ez bigehim miraza xwe

Gur: qo min tu xwarî tuê çawan bigehî miraza xwe?

— Di Jawanîya xwe de min gelek gunehên qiçiq û mezin qirine, êdin bûme pîr, xweşî û nexweşîyên dinyayê jî dîtine. Rabûm çûm niq melê, hal û hewalê xwe jê re gotin. Ewî gote min: « Tu meçî hecê, mala Xwedê tewaf meqî, ev gunehên ha li ser te ranabin » Jû pêve dibêjin qo mirov ji dil berê xwe bidit mala xwedê, ji sêlûna derîyê xwe derqevit, li qû derê bimirit jî heca wî berdar dibit. Vêca heqe tu niho min bixwî heca min dê kebûl bibit.

Gurî rovî berda û jê re got:

— Tu ji dil diçî hecê

Rovî dilê gur tijî qir qo ji dil diçe hecê. Gurî jê re got:

— Weqî niha ez bi te re bêm hecê, tu min digel xwe bibî.

— Herê, û ji hire heta wê derê xizmeta te jî dê biqim.

Gur qet pêşîyê, rovî da pey. Demeqê çûn, rastî qereqî hatin, wê xurm - xurma wî ye, giyayî dixut. Dema qerî gur dît bû firihîna wî. Rovî lê rabû û got:

— Hey bêfehîto, te çi hal e, ev mezineq yê heywanan e, berê xwe daye mala Xwedê.

Qerî got: ji dil?

— Ma çi, belê ji dil

— Hon min jî bi xwe re nabin, ezê bi rê ve xulamîyê ji we re biqim.

Qer jî qet nav wan û dan rê.

Wext buhar e, qer têr giyayî dixwe û avê vedixwe, ziqê xwe diçêrîne.

Gur tobedar e, tu pezî naquje, rûj bi rûj kels û jar diqeve. Carqê ji rovî re dibêje:

— Heyran ez nema debar diqim, ji nêza dê bimirim

— Ez dizanim tu çi dibêjî lê berê me li mala Xwedê ye, gunehqarî li me naye. Divêt em qerî bêxin rêza şerîetê, ew jî qarê min e.

Piştî demeqê rovî ji qerî re got:

— Qero! te kenc e ne? şev û rûj tu giya û avê dixwî, vedixwî ket li hevalên xwe napirsî, tu nabînî ev camêrê ha ji birçîna dimire

— Ez çi biqim, dinya ji giyayî tijî ye, bila ji xwe re bixut.

— Ma tu nizanî rawir giyayî naxûn, divèt yeq ji me bi rèza şerîetè bête feda qirin. Gora fetwaqê divêt em salên xwe hesèb biqin, herçi bi emr qiçiq derqet emê wî bixun.

Her sê rûniştin qo salên xwe bibêjin. Gurî ji rovî re got:

— Qa rovîyo! tu çend salî yî?

— Cihè, tu tè seqinî bî, ji me zède ye em mijûl bibin

Gur: Kenc nizanim, lè dèyamin a rehmetî digot: « Sala Midyat ava bû wê salè Xwedè tu dayî.»

Weqê rovî ev bihîst, her du destên xwe li serê xwe da, dest bi girînè qir û got:

—Ax te birînên min axivandin, wê salè, du qurên min èn xort qo—simbèlan avèti bûn ser lèvan-her du jî bi jin û zaro, serên we xweş, mirin.

Dora qerî hati bû. Qerê reben di dilê xwe de digot: « Ev şèwira xwarina min e, salên wan ji sedan jî bètir derqetin, qer di bin barî de herçend emr biqe, ji bîst salan bètir namîne. » Berê xwe da hevalèn xwe û ji wan re got:

—Ez jî salèn xwe rind nizanim, lè belè tète bîra min qo dèya min ji min re goti bû, wextè min tu sol qirî, li ser sola te ya lingè rastè rûjê zayînê te da nîvîsandin

Gurî gote rovî: Ra be bixwîne.

Rovî rabû ser xwe, qerî lingê xwe hilda, rovî ji dûr ve lè fedqirî, vegeriya hat niq gurî û jê re got:

— Serê te xweş, wê sala qo her du qurên min mirin, çavên min ji girîyê tarî bûne, dıgel vê jî, xetê latînî ye, ez kenc ji hev dernayêxînim.

Gurî xwe nepixand û got:

— Ev qarê min e, min zehf xwendiye, bi xetê erebî jî zanim, latînî jî.

Rabû ser xwe, xwe nîzingî qerî qir. Qerî lîngê xwe hilda, gur balê ve çû, qerî her lingê xwe qêşanad, heta gur taze nîzing bû.

Qerî li navbera her du birihên gurî pehnîyeqe zor da. Her du çavên gurî derqetin, mejîyê wî di guhên wî re avêtin.

Weqê rovî welê dît girî û qerî.

Qerî ji rovî re got:

— Mirov ne şîna te zane, ne jî şahîya te

Rovî lê vegerand:

— Weqê tê bira min qo gurî berê xwe da bû mala xwedê girîyên min jê re tên. Lê weqê xwendina latînî tête bîra min, qenên min tên. Malxrabo ma qengê te Hawar xwendiye qo bi herfên latînî bizânî.

Beha : 25 Kemerî - Şûrî